Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1184 | 7-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

## Bi wêneyan 'Meşa Azadiyê'



Duryanên girîng ên dîroka Tevgera Azadiya Kurdistanê, di bin navê "Meşa Azadiyê" de, bi wêneyên li ser dîwaran hatine xêzkirin hatin vegotin.
Tevgera Çand û Hunerê ya Mezopotamya (TEV-ÇAND) di çarçoveya pêngava "Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî Ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî" de, beşên girîng ên dîroka Tevgera Azadiya Kurdistanê bi wêneyên ku li ser dîwaran hatine xêzkirin, nîşan dide.
Xebata çêkirina wêneyan 4'ê Nîsanê di roja rojbûna Rêber Abdullah Ocalan de dest pê kir. Wênesazên TEV-ÇAND'ê li ser dîwarên derve yên Stadyûma Şehîdên 12'ê Adarê ya li bajarê Qamişlo wêneyên ku duryanên girîng ên Tevgera Azadiya Kurdistanê nîşan didin xêz kirin.
Di xebata ku navê "Meşa Azadiyê" lê hatiye kirin, bi dawî bûye û 29 wêne li ser dîwarê stadyumê hatine xêzkirin. Li ser her wêneyekê jî dîrok û navê merheleya girîng a dîroka Tevgera Azadiyê hatiye nivîsandin.

**Di rojên pêş de wê danasîn bê kirin**

Rêvebira TEV-ÇAND'ê ya Bakûr û Rojhilatê Suriyeyê Sumeya Mihemed diyar kir ku xebata wan bi dawî bûye û destnîşan kir ku dê di rojên pêş de bi merasîmekê danasîna wêneyan bikin.

## Gulfiroşê gerok

Bi ereboka xwe ya destan ku zêdetirî 20 cureyên gulan li ser hene, li kolanan balê dikişîne.. Îsamîl Ebdulkerîm ê 50 salî, piraniya temenê xwe bi firotina sebzeyan a li ser erebokê derbas kiriye. Lê hezkirinek wî ya zêde ji bo gulan jî heye. Lewma di demên dawî de biryar daye ku êdî bi ereboka xwe ya gerok gulan bifiroşe.
Li ser ereboka Apê Îsmaîl zêdetirî 20 cureyên gulan hene. Bi gul û ereboka xwe li kolanên taxa Qudurbeg a Qamişlo bala hemû şêniyan dikişîne.
Apê Îsamîl diyar kir ku firotina gulan tenê ji bo qezenckirina madî nîn e, ji gulan hez dike û dixwaze wan belav bike.



## Solbend



Xalid El Elî solbendiyê yekane li kantona Tebqayê kir ku bi pisporî û afrînerî vê pêşeyê dike û pêşkêşî muşteriyên xwe dike.
Solbendî (Çêkirina pêlavan) yek ji pîşeyên herî kevnar e ku heta roja me dewam dike.
Xalid El Elî yê çil salî, ya ji Dêrazorê karê bavê xwe Cemal El Elî girtiye, bavê wî ji salên şêstiyê de li Tebqayê bi cih bûne û yekem solbendî li vê kantonê dike. Xalid pêşesaziya kevnar ji bavê xwe fêr bûye.
Di sala 1978`an de bavê Xalid dikaneke biçûk vedike û bi bavê xwe re kar dike.
Xalid heta niha ew kevirê ku berê 50'î sale bavê wî bi kar tanî ew bi kar tine.
"Terlik Dêrî" cureyeke ji çanda cilên folkilor ên erebî ye, bi taybet di kantona Dêrazorê tê bikar anîn, Terik bi taybet havînan tê bikar anîn û heta roja îro jî çandekî giring e.
Xalid hin pêdiviyên karê xwe çerim, mîx û hin kilaş- li dikana bavê xwe dihêle û kilaşan çêdike û difroşe, buhayê her Terlikekî 85 hezare.
Xalid El Elî dibêje: Di destpêka kar de me madeyên qenc û çermên sirûştî bikar dianîn, lê di vê rewşa dawî de pîvanên bazaran hatin guhertin û tiştek bi navê eslî û sexte nema û her tişt bûye tîcarî.

Sudoku: Bersiv 95

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 9 | 2 | 8 | 1 |
| 7 | 1 | 6 | 2 | 5 | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 4 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 |
| 3 | 5 | 8 | 1 | 4 | 2 | 6 | 7 | 9 |
| 1 | 9 | 7 | 6 | 8 | 5 | 4 | 2 | 3 |
| 6 | 2 | 4 | 3 | 9 | 7 | 5 | 1 | 8 |
| 4 | 3 | 1 | 8 | 7 | 6 | 9 | 5 | 2 |
| 8 | 6 | 5 | 9 | 2 | 4 | 1 | 3 | 7 |
| 2 | 7 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 | 4 | 6 |

Sudoku:Pirs 96

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 3 | | 7 | | | 5 | | |
| | | | | 3 | 5 | 4 | | 1 |
| | 1 | | | 4 | | | | 3 |
| 4 | | | | | 7 | 8 | | |
| 8 | | 2 | | | | 1 | | 4 |
| | | 1 | 6 | | | | | 9 |
| 7 | | | | 5 | | | 1 | |
| 3 | | 6 | 2 | 1 | | | | |
| | | 8 | | | 9 | | 3 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kelemek e:**
-Di nava êla xwe de xuya ye; bi gotina wî tê kirin.
**Kelemê di çavê dijmin de ye:**
- Dijmin jê ditirse; hesabekî mezin jê dikin.
**Kelemê li ber çavê dijmin e:**
- Bi heman wateyê.
**Ker û golikan li cem hev girê nedin, da ji hev fêrî tir û fisan nebin:**
- Kesên nebaş bandorê li dora xwe dikin.
**Li libokê xist:**
- Derba wî ciyê xwe girt; gotina wî ciyê xwe girt.
(Libok: Parçeyekî goşt e, ji bo girtina heywanan bi xefkê ve dikin)
**Lingeke :**
- Bibandor e; xwedîgotin e.
Tiliya xwe li qûna wî xistiye/tiliya xwe xistiye qûna wî.
- Bi kêmayiyên wî dizane; kêmê xwe kiriye; ji xwe tirsandiye.
**Tu ker û hespan li cem hev girê bidî, wê ji hev fêrî tir û fisan bibin:**
- Tu kesên nebaş bînî cem hev wê ji hev fêrî tiştên xirab bibin.
**Xwedîgotin e:**
- Gotina wî bibandor e; gotina wî tê guhdarîkirin.

**LI SER KESÊ PIR ÇALAK**

Av bisekine ew nasekine/av **disekine ew nasekine:**
- Pir bi liv û tevger e; di cihê xwe de nasekine.
**Av di navbera wan de derbas nabe/av di navbera wan de naçe:**
- Ji hev pir hes dikin; têkiliyên wan pir xurt in.
**Xwêya di agir de ye:**
- Pir bi liv û tevger e; li cihê xwe nasekine.

**LI SER LIHEVNEKIRINÊ**

**Ava her duyan di coyekê de naçe:**
- Bi hev nakin; ji hev nagirin; ji hev hes nakin; nikarin bi hev re hevaltiyê bikin.
**Ava wan di saîkekê de naçe:**
- Bi heman wateyê.
**Ji hev re gur in, ji dijmin re pir in:**
- Yekîtiya wan nîne; bi hev nakin.
**Li bayê hev neketin:**
- Bi hev nakin; ji hev nagirin; ji hev hes nakin; nikarin bi hev re hevaltiyê bikin.
**Li hev nabanin:**
- Bi heman wateyê.
**Ma navika me bi hev ve girêdayî ye:**
- Ma em neçar in ku bi hev re bin; ma çima em ji hev cuda nabin; em ji hev cuda bibin baştir e.
**Navika me bi hev re nehatiye birîn:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## Wê Konseya Ewropa biryara têkildarî Rêber Abdullah Ocalan binirxîne

Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê biryar da rewşa Rêber Abdullah Ocalan ku sala 1999'an bi komployeke navneteweyî revandin Tirkiyeyê û ji hingê ve li Îmraliyê di nava şert û mercên giran ên tecrîdê de tê ragirtin, bixe rojeva xwe.**R-5**

## 'Divê Hikumeta Iraqê dijî êrişên Tirkiyeyê xwedî helwestek rast be'



Şîrovekarê siyasî Elî Hebîb derbarê êrişên dewleta Tirk de got; "Êrişên dewleta Tirk binpêkirina serweriya Iraqê ye, divê Hikumeta Iraqê xwedî helwest be. Dewleta Tirk ji bo armanc û destdirêjiyên xwe yên ser xaka Iraqê, PKK'ê dike hêncet, ev yek jî nayê pejirandin."**R-3**

## Pêşketina jinê di werzîşê de encama keda bi salan e



Bi şoreşa 19`ê Tîrmehê re, wekî tevahiya qadan, jinan di qada werzîşê de jî gavên mezin avêtin. Hevseroka Yana Berxwedan Sîdar Hac Mihemed diyar kir ku tevî rêjeya jinan di werzîşê de ji ya mêran kêmtire jî, lê jinan hêza xwe isbat kir.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1184 | 7-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# RAMANÊ RÊBER APO PIRA AZADIYA GELAN E

Rêberê gelan Abdullah Ocalan bi fikrê xwe yê azad di nava tevahiya gelên herêmê de ruhê demokrasî, azadî, wekhevî û biratiya gelan neqişand. Li cografya Kurdistan û Rojhilata Navîn ku sîstema netew-dewlet a serwer hewl da bi yek rengî boyax bike. Bi hişmendî û têkoşîna Rêber Apo rewş û taybetmendiya xwe ya bi hev re, pirçandî û dewlemend hate dîtin û veguherî yekîtiya gelan a li ser bingeha biratî û rûmetdariyê. Rêber Apo bi fikir û têkoşîna xwe ya komunal û demokratîk ku li dijî nijadperestî, neteweperestî û zayendîperestiyê ye, bala tevahiya azadîxwazên cîhanê dikşîne û roj bi roj fikrê wî dibe gerdûnî.**R-5**



## Rastiya Rojê li her du parzemînên Emerîkayê...(5)



Şaristaniyên li her du parzemînên Amerîkayê yên kevin pir cih dane baweriya bi hêza rojê û rastiyê wê. Dema mirov li hin wan şûnewarên kevin binêre, neqş û resmên li ser keviran hema bêje li gelek deveran ev sembol hatiye dîtine. An sembolê çav û agir ku nûnertiya rojê dikin tên dîtin.**R-6**

## Dirbeka Mehmûd Bekir astengiya bedenê derbas kir



Mehmûd Bekir muzêkjenekî kurd e ku di sala 1976'an de li Qamişlo ji dayik bûye. Ew amûrjenê dirbekê ye, tevî astengdariya di destên wî de lê hezkirin û vîna wî ji fêrbûna dirbekê re ti astengî nas nekirin. Herwiha ji sala 1985'an heya roja îro xebata muzîkjeniyê didomîne.**R-7**

# Pêşketina jinê di werzîşê de encama keda bi salan e

Bi şoreşa 19`ê Tîrmehê re, wekî tevahiya qadan, jinan di qada werzîşê de jî gavên mezin avêtin. Hevseroka Yana Berxwedan Sîdar Hac Mihemed diyar kir ku tevî rêjeya jinan di werzîşê de ji ya mêran kêmtire jî, lê jinan hêza xswe isbat kir.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Di dema civaka xwezayî de ya ku bi navê 'kilan' tê naskirin an jî dema 'Jin dayikê' ji ber ku di wê demê de jin civak ji hemû aliyan ve birêve dibir û wekhevî di navbera jin û mêran de hebû. Piştî dema jin dayikê, serdema şarestanî hat destpêkirin, dema ev serdem hat destpêkirin, dema jindayik çû ya baviksalariyê hat. Di wê demê de ji aliyê mêr hemû berhem û kedên jinê hat desteserkirin, lewra jin mîna koleyekî hat bikaranîn. Serdem li ser vê yekê derbas bû û jin bi hezarên salan ji mafê jiyanî bêpar û winda ma, bi taybet di aliyê werzîşê de. Niha her kes meraq dike çi girêdana werzîşa jinê bi civaka xwezayî û serdema baviksalariyê heye, lê ew e ku dema bavkirsalariyê jin bêparî her tiştî hat kirin, werzîş jî di nava wê de.



**Jin ji qada werzîşê hatibû dûrxistin**

Heger em bên roja îro bi taybet berî şoreşa 19`ê Tîrmehê, jina kurd û hemû jinên ku li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin bindestê desthilatdaran bûn. Lê bi hatina şoreşê re jin di nava hemû qadan de cih girt û li kêlek wê astên girîng bidest xist, yek ji wan qadên girîng ji bû hemû mirovan re û jin jê hatibû dûrixistin, qada werzîşê ye. Spor mîna her jêhatiyekê din li cem hin mirovan jêhatiya serekeye, ev jêhatî ne tenê ji mafê mêran re ye, lê ji jin û zarokan reye jî. Di dema serdestan û desthilatdaran de werîş ji jinan re şerim dihat dîtin, lewra jin derfet û xwena xwe ya ji werzîşê re di nava şoreşa Rojava pêk anî.

**Werzîş ji mafê hemû mirova ne**

Dibe ku di roja îro de rêjeya jinê di nava werzîşê de ne qasî rêjeya mêran e, lê dema ku mayina wê di nava werzîşê de ji dema berê tê hevrûkirin tê xuyakirin ku bi vê rêjeya kêm jî xwe daye isbatkirin û pêşxistin. Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê gaveke baş di aliyê werîşê de avêtiye, mîna ku niha giropên jina yên lîstika şetencê, goga lingan, goga piyan, goga masê, pînpong û hwd… de hatiye avakirin. Û ya girîng ew e ku her cara ku jin tevlî şampiyonan jî dibe astekê bidest dixe, ji ber tevlîbûna jinan ji sporê re ji hizkirinekê tê, ne ji bo navûdengiyekê ye. Piraniya mirovan ne bi armancekê xwe werzîş dikin/e, lê ji ber hizkirineke wan ji werzîşê re heye, ev nayê wateya ku tenên mirovên sporvan sporê bikin, ji ber spor mafê her mirovekî ye. Çi werzîşa ku hebe sûdên wê li mirovan heye, sûdên wê li mejî, deronî û fîzîkiya mirovan tevahî heye. Werzîş çalakiyeke gorî hin destûr û mercan de tê pêşbazî kirin.

Girêdayî rola jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di qada werzîşê de, Hevseroka Yana Berxwedan ku di heman demê de Lîstikvana Şetrencê ye Sîdar Hac Mihemed ji rojanameya me re axivî. Lîstikvana şetrencê ya ji bajarê Qamişlo Sîdar Hac Mihemed diyar kir ku ew di temenê 7 salî de fêrî lîstika şetrencê bûye û wiha got: "Berî ku ez derbasî jêhatiya xwe bibim, dixwazim girîngiya werzîşê bidim xuyakirin, bi taybetî ji bo jinan. Niha rastiyeke ku civaka me pê jiyan kiriye ku jin dûrî hemû qadên jiyanî be, tenê di malê de be, ev yeke jî beriya şoreşa 19`ê Tîrmehê bû. Herwiha jinên ku werzîş jî didîtin tenê yên xwendevan ku di heftiyekê carekê li dibistanê werzîş didîtin ji bilî wê yaneyên taybet bi jinan tinebû. Werzîş ne ew nerîna ku civak pê dihizire lê werzîş di her alî de alîkarê mirova ne."

**'Fêrkirina şetrencê ji min re bû meraq'**

Sîdar Hac Mihemed anî ziman ku ew di riya Apê xwe re fêrî lîsteka şetrencê bû û wiha got: " Li gorî ku tê bîran min dema ku temenê min 7 salî bû, carekê min dît dema Apê min û hevalên xwe bi şetrencê lîstin, wê demê ji min re meraq bû ku şetrenc çiye? Lewra min xwest ez fêrî lîsteka şetrencê bibim, ji bo wê min ji apê xwe daxwaz kir ku min fêrî şetrencê bike, bi demê re û ji hizkirina min ya zêde jî lîsteka şetrencê re ez fêrî wê bûm. Herwiha di berdewamiya fêrkirina min ji lîsteka şetrencê re, ez tevlî şampiyona bûm û şampiyona yekem tevlî wê bûm, li bajarê Qamişlo dema ku temenê min 13 salî bû, di wê şampiyonê de min du ast bi dest xistin asta duyemîn, di heman demê de asta lîstikvanê baş jî bi dest xistin, piştî wê tevlî şampiyonên din jî bûm, di wan de yekemîn derketim, li kêlek wê şampiyona ku li bajarê Reqa li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatibû lidarxistin, di wê şampiyonê de girop hebûn, ji wan giropan em li ser ya Cezîrê yekem derketin û di lîsteka ferdî de min asta 3`emîn bi dest xist."

**'Şetrenc hêza mejî jêr pêwîste ne hêza masûlkeyan'**

Sîdar Hac Mihemed di berdewamiya axaftina xwe da xuyakirin ku wê şert û mercên jiyanê nekir asteng li pêşiya berdewamiya wê ji lîstika şetrencê re û wiha got: "Beriya ku ez tevlî Yana Berxwedan de bibim, min di nava Yana Diclê de cih digirt. Di qonaxê fêrkirinê de demekê hin şert û merc ez rastî wan hatim, bû sedema ku ez demek baş dûrî şetrencê bibim, lê min pêşketinên xwe ji bû şetrencê her berdewam dikir û min nehişt şert û merc bibin asteng li ber berdewamiya min ji lîsteka şetrencê re. Şetren bi lîsteka qiralan tê naskirin, ji ber qiral yên ku yekemîn bi vê lîstikê dilîstin û kesên ku bi vê lîstikê dilîzin ne bi hêza masûlkeyên xwe pê dilîzin, lê bi hizira xwe."



**'Armanc jina kurd li cîhanê bê nasîn'**

Sîdar Hac Mihemed axaftina xwe wiha qedand: "Armanca min ji sporê re ew e ku navê jina kurd di nava sporê de li ser asta cîhanî binav û deng bibe, ya din jî ku em jêhatiyên xwe di nava sporê de diyar bikin, mîna ku tê gotin goga lingan ya mêran e, lewra em dixwazin vê hizirê jî bişkînin û bidin isbatkirin ku jin jî dikare bi goga lingan jî bilîze. Astengiyên ku li pêşiya me derdikevin pirî caran şampiyonên derveyî bajarê Qamişlo derdikevin lê hin malbat dibêjin em keçên xwe naşînin derveyî bajar ev jî dibe astengiyek li pêşiya pêşketina spora wê jinê."

# 'Kêm maye Herêma Kurdistanê li cîhanê bi tundiya li dijî jinan bê naskirin'

**Navenda Nûçeyan**

**Têkildarî zêdebûna rêjeya tundiya li ser jinan li Herêma Kurdistanê çalakvanên mafên jinan dan zanîn ku sedema sereke ya zêdebûna tundiyê nebûn û cîbicînekirina yasayên li dijî tundiya li hemberî jinane.**

Çalakvanên mafên jinan fikarên xwe li beramberî zêdebûna rêjeya tundiya li dijî jinan nîşan dan û gotin "Herêma Kurdistanê di aliyê qetilkirin û xweşewitandina jinan de ber bi rêjeyeke rekorê ve diçe. Lewra em bi tundî Hikûmeta Herêma Kurdistanê rexne dikin, ji ber ku yasayên tund li dijî qetilkirina jinan cî bi cî nake."

Li Herêma Kurdistanê ji ber hişmendiya baviksalarî tundiya li ser jinê zêde dibe. Jin bi her awayî tên kuştin û şewitandin. Çalakvanên jin dibêjin, rewş heyî metirsîdare û bang li aliyên peywendîdar dikin ku gavên cidî û bilez ji bo bidawîkirina tundî û kuştina jinan li Herêma Kurdistanê bên avêtin. Her wiha dan zanîn ku kêm maye Herêma Kurdistanê bi qetilkirin û tûndiya li dijî jinan bê naskirin.



**Hetaw Mihemed**

Têkildarî mijarê Hetaw Mihemed û Gulistan Ehmed nêrînên xwe vegotin. Hetaw Mihemed têkildarî tundiya li dijî jinan dîtinên xwe wiha bilêv kirin; "Yasa bi tena serê xwe nikare tundiyê di nava civakê de ji holê rake. Di serî de divê em ferdên civakê hemûyan perwerde bikin, hişmendiyê biguherin da ku hemû kuştin û şewitandinên jinan ji holê rabin. Ji ber ku emê rêjeya zêde ya tundî û kuştina jinan di rêzên destpêkê yên îstatîstîkên cîhanê de cih bigirin."



**Gulîstan Ehmedî**

Hetaw da zanîn ku li Herêma Kurdistanê yasayên li dijî tundiya li ser jinan û qetilkirina jinan nayên cî bi cî kirin, lewra pêwîstî bi cî bi cî kirina yasayên tund heye ji bo pêşîlêgirtina her cûre tundiyê.

Aktîvîsta jinan Gulistan Ehmed jî di vê derbarê de hestên xwe wiha vegotin; "Zêdebûna tundiya li ser jinan ji ber çend sedemane. Ji wan sedeman yek jê rewşa nebaş ya Herêma Kurdistanê û nebûna aramiyê ye."

Gulîstan Ehmedî tekez kir ku nepêkanîna yasayan sedema sereke ya zêdebûna tundiya li ser jinane û got; "Hikûmeta Herêma Kurdistanê û aliyên peywendîdar divê bi cidî li dosyayên tundiya li dijî jinan binêrin û sedeman diyar bikin da ku çareseriyên guncaw bên destnîşankirin."

Girêdayî vê yekê jî rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AMNESTY) derbarê rewşa jinan ya li Herêma Kurdistanê raporek belav kir û hate gotin; "Desthilatdarên Herêma Kurdistanê di warê parastina mafê jinan de binketine, yasayên dijî tûndiyê tenê nivîseke li ser kaxezê ye."

Di raporê de behsa yasaya têkoşîna dijî tundûtujiya malbatê ya herêmê û wiha tê gotin; "Ev yasa tenê reş nivîseke li ser kaxezê û desthilatdar jî di parastina mafê jinan de binketine. Li gorî lêkolînên dawî, li Herêma Kurdistanê jinên ji tundiya malbatê rizgarbûne rubirûyî astengiyan tên. Berpirsên herêmê di dadgehkirina sucdaran de, taybet jî ya bûyerên weke kuştin, destdirêjiya zayendî, lêdan û şewitandinê de bi ser neketiye."

Di dewama raporê de tê gotin, ispat bûye ku ji bo dadgehkirna sucdar û kesên destdirêjiyê dikin, ti îradeyek siyasî nîne û wiha tê gotin; "Ti piştgiriyek cidî ji bo jinên ku serî li saziyên peywendîdar ên hikumetê dikdn nîne. Ti hêviyek ya jinên ji tundiya malbatê rizgarbûne, nîne. Dema jinên rizgarbuyê di stargehên jinan de tên bi cih kirin, xwe di rewşek mîna girtîgehê de hîs dikin. Gelek caran jî ji ber tedbîrên tund, neçar dimînin ku heman rewşa berê ya tund jiyan bikin.

Raste li Herêma Kurdistanê yasaya têkoşîna dijî tundiya malbatê heye, lê ev yasa li gorî lêkolînên me, tenê nivîsek ya li ser kaxezê ye.

Cezayê hinek sucdaran li gorî tê xwestin nayê dayîn, lewma hinek jin naxwzin biçin dadgehê. Di sala 2023'yan de herî kêm 30 jin di bin navê şerefê de hatine kuştin. Di sala 2022'yan de 44 jin hatine kuştin. Herwiha 10 hezar û 896 giliyên tundiya malbatê hatine qeydkirin."



# Dirbeka Mehmûd Bekir astengiya bedenê derbas kir

Mehmûd Bekir muzêkjenekî kurd e ku di sala 1976'an de li Qamişlo ji dayik bûye. Ew amûrjenê dirbekê ye, tevî astengdariya di destên wî de lê hezkirin û vîna wî ji fêrbûna dirbekê re ti astengî nas nekirin. Herwiha ji sala 1985'an heya roja îro xebata muzîkjeniyê didomîne.

**Hemze Sêvo/ Qamişlo**

Qada hunera muzîkjeniyê, mîna qadên din yên hunerî xwedî taybetmendiyeke cuda ye. Warekî girêdayî hest, afrîneriya kesayet û vîna mirov e, da ku mirovek bibe muzîkjenek û xwe fêrî jenandina amûrên muzîkê bike, pêwîste rahênana muzîkjeniyê bike. Muzîkjenê kurd yê ku ti astengî nas nekir û bû muzîkjenekî navdar li Rojavayê Kurdistanê Mehmûd Bekir e.



**Xwendin û qonaxa zaroktiya Mehmûd Bekir**

Mehmûd Ismayîl Bekir di sala 1976'an de li taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo ji dayik bûye. Di malbata xwe de yê herî biçûk e. Xwendina xwe ya seretayî li dibistana Hatim Eltayî qedandiye û li dibistana Hetîn xwendina navîn jî domandiye. Piştre xwendina çandiniyê heya refa 11'an xwendiye û wê demê wî di qonaxa amadehî de xwendina xwe rawestandiye. Sedem ew bû ku wî karê hunerî dikir, derdiket zemawend û şahiyan, di heman demê de xwendin bi wî ne hêsan bû. Herwiha karekî cuda jî di ber karê hunerî re dikir. Di sala 1983'an de ew û dê û bavê xwe bi hev re diçin bajarê Helebê, di wê demê de ew gelekî biçûk bû. Dema ku ew û malbatê bi hev re li Helebê digeriyan amûra dirbekê hizir û bala muzîkjen Mehmûd Bekir ber bi aliyê xwe ve dikşîne. Hezkirineke mezin ji wê dirbeka biçûk re li cem wî dest pê dike. Lewma daxwaza kirîna wê ji bavê xwe dike û bavê wî jî daxwaza dilê Mehmûd pêk tîne. Mehmûd Bekir mirovekî ji destê xwe ve astengdar e, destê wî ne saxlem in û ev yek ji zikmakî ve ye, lê hezkirina wî ji vê amûrê re nebû asteng ku xwe fêrî dirbekê bike. Dema ku ew û malbata xwe vegeriyan Qamişlo, êdî li malê dest bi lêdana li ser dirbeka xwe ya biçûk dike.

**Astengdariya laşê wî nebû kelem li pêşiya riya hunerî**

Dema ku muzîkjen Mehmûd Bekir biçûk bû û diçû dibistanê, dema ku zarokan ew didîtin, ji ber astengiya destê wî ditirsiyan. Ev yek jî tiştekî normal e, ango dema zarok tiştekî wisa xerîb bibîne, wê matmayî bimîne û tirs li cem çêbibe. Zarok li dibistanê û di nav civakê de xwe ji Mehmûd Bekir dûr dixistin. Lewma carekê diçe cem bavê xwe, êdî gilî û gazinên xwe ji bo vî tiştî jê re dibêje. Lê carekê weke ramanekê dikeve bala wî ku rojekê rahêje dirbeka xwe ya biçûk û here dibistanê, li pêşiya şagirt û mamosteyan li dirbekê bixe. Wî wisa kir jî. Rojekê Bekir rahişt dirbeka xwe û çû dibistanê, wî li qada dibistana Hatim Eltayî li dirbeka xwe xist. Dema ku muzîkjen Bekir dest bi lêdana dirbekê kir, mamoste û şagirtan tevan li dora wî kom bûn û kêf xweş bûn. Wan dît ku çawa bi vê rewşê bi hostayî li dirbekê dixe. Êdî bi şûn de gelek hevalên wî çêbûn û ew tirsa di dilê wan de bi dawî bû û zarok tev nêzî wî bûn, herwiha heya niha jî gelek ji wan zarokan hevalên Bekir in. Ev jî bi saya derbekê û hunera wî bû, ji ber vê yekê jî derbeka muzîkjen Mehmûd Bekir li cemê gelekî pîroz û bi nirx e. Derbek bû sedema ku ew astengiya xwe ji bîr bike û ew ji dilê civakê nêz kir. Astengdariya di bedena wî de, ji bo wî êdî bi saya derbekê nema ji wî re bû astengî. Lê belê Mehmûd Bekir xwe perwerde kir, bi vîna xwe ev huner li pêş xist, di nav re jî zewicî û hîn jî hunera xwe didomîne. Niha jî ew di şaredariya bajarê Qamişlo de jî weke endamê Nivîsgeha Jenetoran kar dike û pê re jî endamê koma Botan e.

**Qonaxa destpêkirina hunera lêdana dirbekê**

Piştî sala ku Mehmûd ji Helebê vegeriya mal û bi riya perwerdeyê muzîkjen Bekir xwe di warê jenandina dirbekê de li pêş xist, di temenekî biçûk de derket şahiyan. Ev yek jî bi saya hunermend Kamîranê Hesarî bû, Mehmûd Bekir, Kamîranê Hesarî weke mamosteyekî ji xwe re dihesbîne. Hunermend Kamîranê Hesarî derdiket zemawendan û hertim jî dihat mala Mehmûd Bekir. Dema ku wî muzîkjen Mehmûd didît ku wisa bi behreyeke mezin li derbekê dixe û asta wî ya bilind dibîne, dibêje Bekir: "Divê tu bi bi min re derkevî dawet û zemawendan." Lewma cara yekê di sala 1985'an de ew pê re derket zemawendekê. Kamîranê Hesarî di wê demê de wî bi xwe re bir bajarê Hesekê. Di wê zemawendê de derbeka ku Kamîranê Hesarî dabû wî, kete erdê û şikest. Ji ber ku ew ketibû kelecaniyeke mezin û di heman demê de jî ew derbek ji ya wî bi 3 caran mezintir bû. Wê demê hunermend Kamîran derbekeke din da wî û moral da muzîkjen Mehmûd Bekir ku wê zemanwendê berdewam bike. Lê piştre bi domana demê re ew baş fêr bû, bi gelek hunermendên navdar derket dawet û zemawendan. Ji wan hunermendan jî Se`îd Yûsiv, Aram Dîkran, Şefîq Bavê Re`ed, Xêro Ebas, Faris Bavê Fîras, Azad Feqe, Nîhad Yûsiv, û gelek hunermendên din… Herwiha ji sala 1993'an ve heta roja îro ew di nav koma Botan ya hunerî de ye. Di heman demê de li Beyrûtê di navbera sala 1996'an heya 1997'an de ew bi Rêber Wehîd re şahî li dar xistine. Herwiha bi hunermend Şeyda, Sefqan Orkêş û Ronî Cezrawî re ji sala 2005'an heya 2007'an ve li Şamê, Tertûs, Hema û Helebê jî şahî li darxistine. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re wî dest ji lêdana derbekê berda û nema diçe zemawendan, lê dîse ew bi koma Botan re bû. Lê di sala 2017'an de dîsa bi riya hunermend Faris Bavê Fîras re vedigere lidarxistina zemawendan, Faris wê demê hat Rojava û bi wî û Osman Faris re şahiyek li dar xist. Wê rojê ew û Osman Faris hev nas dikin û jê re dibêje: "Ez dixwazim tu bi min re derkeve zemawendan. " Lewma ew jî qebûl dike û ji wê demê de ew, Osman Faris û Hisên Derwîş bi hev re derdikevin zemawend, bername û hemû şahiyên hunerî li dar dixin. Heya niha wî 4 awaz û rîtim saz kirine û ew rîtim jî weke berhemên Mehmûd Bekir tên hesibandin.

# Koma Orchid bi xêzkirina tabloyan di nava civakê de hêviyê ava dike

**Navenda Nûçeyan**

**Avakerê Koma Orchid Samir Kalo, diyar kir ku armanca wan ew e ku bi wêneyên ku xêz dikin çanda civaka herêmê nîşan bidin û bajarê ku lê dijîn bi hêviyên mezin xweşiktir bikin.**

Koma Orchid ku di sala 2023'yan de li bajarê Qamişlo hate avakirin, di warê avakirina hêvî û rengdayîna bajarê xwe de, bar rakirine ser milê xwe û li ser dîwarên bajêr wêneyan xêz dikin. Avakerê Koma Orchid Samir Kalo, ji ANF'ê re axivî û diyar kir ku ew bi wêneyên ku li ser dîwarên bajêr xêz dike dixwaze hêvî û xweşikbûnê nîşanî gelan bide.

Samir Kalo ê ji bajarê Qamişloyê ye, di sala 1989'an de hatiye dinê.

Li Zanîngeha Beşiq a Şamê beşa wênesaziyê dixwîne. Piştî salên dirêj Samir Kalo ji bo şagirtan mamostetî dike û biryara avakirina Koma Orchid digire. Koma Orchid a ku bi armanca xweşik kirina bajêr dest bi xebatê kirin, bi giştî nêzî 53 tabloyan li ser dîwarên bajêr xêz kirine.

Samir Kalo, anî ziman ku ew gelek pêşangehên taybet lidar xistine û got, "Yek ji wan pêşangehan 'qêrîna çav' bû. Wêneyên ku di wê pêşangehê de hatine pêşkêş kirin, wêneyên şagirtên min bûn. Ew şagirtên hilbijarte bûn û wêneyên gelek baş xêz dikin. Piştî wê pêşangehê, me komek ji 12 kesan pêk dihat, ava kir. Ev kom li her derê û çalakiyê ango di rojek taybet de bi awayekî kolektif xebatên xwe dikirin. Bi demê re ev hejmar mezin bû di sala 2023'yan de weke koma Orchid bi 22 wênesaz hate avakirin. Endamên koma Orchida ji hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tên."

**Bi 22 kesan destpê kirin, îro bêhtirî 100 endamên xwe hene**

Kalo, da zanîn ku wan bi 22 wênesazan koma Orchid avakirine, lê îro xwedî bêhtir 100 endaman e û wiha domand, "Tenê wênesaz di komê de nînin. Her wiha pisporê Make Up sînemayê, karîkatorvan û kesên beşên weke potre, dîkor xwendine hene. Ji dema avakirina komê heta niha me gelek wêneyên xwe li ser dîwaran xêz kirine. Bi dehan çalakiyên wiha me pêk aniye. Armanca me ji vê xebatê ew e ku em tiştek nû di bajêr de bidin çêkirin û li ser wan dîwarên sade yan jî yên ku ji ber duya wesayîtan û jeneratoran reş bûne, biguherin. Me xwest em ruhekî di bajêr de avabikin. Me xwest em tiştekî nû avabikin."

**Wêne li gorî çanda herêmê têne xêzkirin**

Samir Kêlo, da zanîn ku wêneyên ku koma Orchid xêz dike hemû girêdayî çanda herêmê ye û wiha axivî, "Mînak tabloyên ku ji bo rojên girîng hatine xêzkirin ev in; Cejna Newrozê, 8'ê Adarê, sersalê û hin



cejnên girêdayî pêhateyên din ên herêmê ne. Hin tablo bi taybet ji bo zarokan hatin xêzkirin. Tabloya herî dawî ku tabloya me ya herî mezine û nûnertiya aştiyê dike, me diyarî tevahiya gelan kir. Koma Orchid li ser projeya çîroka serketinê xebatên xwe dimeşîne. Koma Orchid bi hêz û kelecaneke mezin li ser vê projê kar dike, da ku ji gelê xwe re pêşkêş bike."

# Rastiya Rojê li her du parzemînên Emerîkayê...(5)

Mistefa Rêzan

Şaristaniyên li her du parzemînên Amerîkayê yên kevin pir cih dane baweriya bi hêza rojê û rastiyê wê. Dema mirov li hin wan şûnewarên kevin binêre, neqş û resmên li ser keviran hema bêje li gelek deveran ev sembol hatiye dîtine. An sembolê çav û agir ku nûnertiya rojê dikin tên dîtin. Balkêşa ku mirov bibîne ku li çar aliyên cîhanê di dîroka kevin de, bibîne ku ewqasî roj hatiye pîrozkirin. Daneyên li ber destê dîroknas û arkeologan têrê nake ku mirov vê rastiyê baş analîz bike û pênase bike. Li vir mirov hemû şaristaniya nikare bîne ziman. Lê belê em ji çendek ji despêbikim.

**1-Pîroziya rojê li ba Înkayê:**

Împeratorya Înka ya kevin, ji aliyê Indiyên Sorpost li parzemîna Amerîka Başûr hate avakirin. Ev şaristanî li Bolîfiya, Pîro, Ekuador, Çîlî û Arjentîn ve hatiye avakirin. Eger mirov li wateya gotina Înka lêkolîn bike, tê wateya Yekana kurê Rojê. Li gorî dîroka Înkayê, şahbanoya Înka Koya, xwe ji neslê xwedayê rojê dîbne. Civaka Înkayê, di çandiniyê de pir jêhatîbûn. Ji ber ku tevgera sale, her çar werzên salê, derketina û çûyina rojê, stêr û ezmanan dişopandin. Ji lewra ji bo çandiniyê werzên guncaw ji bo çandiniyê hildibijartine, pargaleka avdan ji xwe re sakirin û kenalên avê bi awayekî pir bi hostetî kolan. Avê ji çiyayên bilind bi cihukên dirêj tanîn geliyan.

Îcar şaristaniyên Înka yên kevin di endaziyarî û zanistên din de pir bi pêşve çûbûn. Neqşên li ser dîwarên qesr û perestgehan bi sembolên roj û xwedayên rojê mirovan matmayî dike. Bi taybetî li ev hostayî li peresgehên rojê yên bi nave Alowakas tê naskirin diyar dibe. Pir avakirin, rêvekirin û pergala poste jî çêbkiribûn. Hata hatiye dîtin ku li berwerên çiyayan riyên pir asê di zinar û tehtan de vekirine. Eger ev nişnaeya tiştekî be, ew jî nîşaneya gelê Înkayê gelek siren gerdûn, xweza û jîngehê naskirine. Ji lewra çavdêriya li ser astronomî û rojê, dihêle bêtir karibin tevgera wê fêm bikin û li gorî wê jiyana xwe bi rêxistin bikin. Baweriya Înkayiyan bi jiyana cîhana din heye. Ji lewra miriyên xwe bi cawan wekî mûmyayên Misrê dipêçand û veşartin. Ya din jî Înkayiyan, yek ji mîneralên bi nave Orîkalkom ku bi rengê zer bi sor ve ye qesr û perestgehên xwe boyax kirin. Her weha ji vê madenê gelek kel û pel çêkirin. Gelek mîkanîkên pêwîst ji bo çandinî û deriyên kilîtkirî ji Orîkalkom dane çêkirin. Ev mineral gelek bi qîmet û di xwezayê kême: Rengê wê nêzîkî rengê zêr lê belê ji zêr hişktir û biqiwetir e. Di destanên kevin yên Înka û Aztîkan de hatiye gotin ku ev maden ji rojê hatiye çêkirin.

**2-Pîroziya Rojê li şaristaniya Maya:**

Şaristaniya Maya li herêma navîn a Parzemîna Amerîka ya niha bi Guatîmala, Hindoras û Silvador û herêmên başûrê Meksîkayê dike. Şaristaniya Maya ji sala 2000 Bz hata sala 250 Zayinê dewam kir. Dîroknasan dibêjin, mîraseke dewlmend a vê şaristanyê ku hata 3000 sal dewamkir. Ev şaristanî bi dagirkeriya Îspanyayê dewamkir. Ji hêla endaziyarî, stêrnasî û avahîsazî pir pêşketîbû. Arkeologanji eserên ku keşfkirin dibêjin, civaka Maya dikaribû xwe li gor şert û mercên xwezayê jiyana xwe birêxitin bike, teqwîma jiyana xwe li pergala rojê danîbûn. Di vê şaristaniyê de çandinî, çêkirina cirik, neqşên li ser kevir, honandin û bazirganî hatin bi rêxistinkirin. Maya ji aliyê raman û hunerê ve pir pêşket. Li ser pîramîdên ku Maya li Meksîka avakirin, sembolên roj û baweriya bi roj, hata teqwemên sale hatine dîtine. Di şaristaniya Maya de, gelek pîramîd mîna pîramîdên Misrê hatin avakirin. Bi armanca şopandina ezmanan û xwe gihandina pîroziya rojê. Ev pîramîd bi pîvanên pir hoşmend û endeziyariya bi ziravî hatine avakirin. Jiyan li ser zemîn û dinyaya din gelek bala mirovên Mayayê kişandiye. Jiyan û Mirinê di her derketina rojê û çûyina wê pir pîroz in. Ji ber vê ewqas endaziyarî, çandinî, avahi sazî û stêrnasî hatiya pêşxistin.

**3- Pîroziya Rojê di şaristaniya Aztîkê de:**

Navenda ku şaristaniya Aztîkan lê destpêkir, li Meksîka bû. Paşê li her du parzemînên Amerîkayê bandora wê fereh bû. Baweriya Aztîkan bi gelek xwedayan tê. Mîna şaristaniyên din li Bakûr û başûrê Amerîkayê roj pîroz dibînin. Qewmê Aztîk dema roj ber bi rojava diçe, qûrbanên xwe ji bo xwedayan pêş dikin. Ew bawer dikin ku xwedayên wan ber bi êvarî dimirin û bi bi derketina rojê ve zindî dibin. Hata ji ber vê sedemê ew bi şev nakevin rê, ji ber ku ew bawer dikin ku xwedayê rojê yê wan diparêze tuneye, ji lewra nakevin rê. Wek bi qasî xwedayê roj, xwedayê agir jî pîroz e. Sedema vê ji ber agir germahî dide, tariyê radike û jiyana wan bi ewle dike. Navê xwedayê wan Wîtzîlopeteşlî ye. Di gelek perestehên wan sembolên xwedayên roj û agir bi hev re hatine bicihkirin. Hata peykerên şêr û xeleka serî wî wek rojê ye li pêşiya avahiyên xwe yên pîroz bicih dikin. Di destanan de li ser dîwarên perestgehan hatiya nivîsandin bê çawa xwe digihînin xwedayê roj û qûrbaniyan ji bo dîdin. Hin arkeologan dibêjin, pîramîdên şaristiya Aztîk bi armanca ku mirov xwe bigihînin pîrozî û hêza xwedayê roj hatine avakirin. Xaleke din a girîng ew e ku Aztîkiyan salnameya ku li ser tevgera rojê dimeşe ji xwe kirine esas. Yanî din zaniyaran piştrast dikin ku zaniyariyên şaristiyan Aztîk bi Stêrnasî ango Astronomiyayê hebû. Di bermayên şaristaniya Aztîkan de kevirek ku li ser wê neqşê rojê û teqwîmê hatine çêkirin, hate dîtin. firehiya wê 3,6 m û qalindbûna 1,22 me. Her weha giranidya vî kevirî 24 ton e.

**4-Pîroziya Rojê di şaristaniya Olmêk de:**

Şaristiyan Olmek di navbera



salên 1500-400 BZ fereh buye. Gotina Omek tê waytea gelê Lastîk. Ji ber ku lastîk beşek ji werzişa Olalamalîztlî ye. Ji ber vê navê Olmêk li wan hatiye kirin. Di peyker çêkirinê de, gelê Olmêk bi çêkirina seriyên pir mezin ji keviran hatine naskirin. Tişta balkêş jî, hin peykerên mezin li deverên ku lê ti kevir lê tuneya hatine çêkirin. Arkeolog û zaniyarên erdnîgariyê dibêjin dera herî nêzîk a kevir û zinaran lê peyda dibin 100 km dûrî herêmê ye. Îcar di navberê de çem û daristanên pir asê, golên xeter û golên bataxê hene. Ev rastî dihêle Arkeolocîst acêbmayî bimînin. Li gor zaniyariyan giraniya hin ji van peykeran di navbera 6 hata 40 tonî û bi bilindbûna 3 metreyan de hatine çêkirin. Ev jî asteke bilind bîrewerî, zanebûn û pêşketina teknîka li ba Olmêk diyar dike. Lê belê ev bi çi teknîk hatine çêkirina hata roja me ya îro nehatiye zelalkirin. Olmêk wek şaristanî di ware naskirina xweza û gerdûnê, stêrnasî û rojê xwedî zaniyariyên pir pêşketî ku hata roja me ya îro bi têrkerî nehatiye pênasekirin.

Di nava Meksîkayê de Pîramîdeke bi nave Tiyotîhoakan ango bi pîramîdê rojê hatiye naskirin. Ev pîramîd li ser şekefteke pîroz hatiye avakiirn. Di wêneyên li vê herêmê hatine keşifkirin, li dora pîramîd çem hheye, ku nişaneya zindîbûn, berhemdarî û jiyanê ye. Serê pîramîd ber bi gerdûna berfireh û ezmanan diçe. Lê aliyê jêr pîramîd ango şikefta pîroz, Olmêkî wek cihê jiyana li cîhana binî ango cîhana din dibînin. Roj li ser pîramîdê semola jiyanê ye û tartiya şekeftê sembola mirin jiyana axiretê ye. Îcar çiqas jiyana bi pîroziya rojê û heqîqeta gerdûn li ba Olmêkiyan pîroz ji van şûnewaran diyar dibe. Li ser gerdûn û jiyana li ser erdê û axiretê pir ponijîne. Tirsa ji mirina û tartiyê bi rengê axretê îfade dikin û roj jî wekî sembola jiyan, berhemdarî û jiyanê pênase dikin.

Di dawiyê de mirov li ser heqîqeta hebûn, di ronahiya bîrewerî û aqil de diponije. Roj tartiyê radike. Watedayina ronahiyê di ramanê de, ji wateya fîzîkî wêdetir wateya gihiştina heqîqeta hebûn û afirîneriya jiyanê ye.

**Not: Beşa dawî ya nivîsê**



# ‘ Divê hikumeta Iraqê dijî êrişên Tirkiyeyê xwedî helwestek rast be’

Şîrovekarê siyasî Elî Hebîb derbarê êrişên dewleta Tirk de got; “Êrişên dewleta Tirk binpêkirina serweriya Iraqê ye, divê Hikumeta Iraqê xwedî helwest be. Dewleta Tirk ji bo armanc û destdirêjiyên xwe yên ser xaka Iraqê, PKK’ê dike hêncet, ev yek jî nayê pejirandin.”

Navenda Nûçeyan

Şîrovekarê siysî Elî Hebî derbarê êriş û dagirkeriya dewleta Tirk ya li ser xaka Iraq û Herêma Kurdistanê nirxandinên xwe kirin.

Elî Hebîb destnîşankir ku êrişên dewleta Tirk binpêkirina serweriya Iraqê ye û bang li hikumeta Iraqê kir ku dijî êrişan xwedî helwest be.

Êlî Hebîb da zanîn ku Tirkiye dosyaya Partiya Karkerên Kurdistanê ji bo armanc û destdirêjiyên xwe yên ser xaka Iraqê dike hêncet, lê ev yek ne cihê pejirandiniyê ye. Hebîb got ku bêdengiya Hikumeta Iraqê ya dijî êrişan, egera peymanên veşartî ya di navbera Iraq û dewleta Tirk de derdixîne holê.

Dawiya axaftina xwe de şîrovekarê siyasî Elî Hebîb bang li Herêma Kurdistan û Bexdayê kir ji bo ku êrişên Tirkiyeyê werin rawestandin, xwedî helwestek rast bin.

Girêdayî heman mijarê Xelef Xefûr diyar kir ku Tirkiye, ti carî nikare gelê Kurd û PKK’ê tune bike

Nivîskar û Rojnamevan Xelef Xefûr diyar kir ku divê li dijî êriş û dagirkeriya Tirkiyeyê helwest were raberkirin, ji ber ku dibe sedema bi dawîbûna jiyana welatiyan û çandiniya li gundan û wiha got: “Dewleta Tirk nikare planên xwe yên ji bo bidawî anîna PKK’ê pêkbîne. Divê dewleta Tirk doza gelê Kurd di navxweyî de çareser bike, ji ber ku dozek rewaye.”





Xelef Xefûr

Dagirkerî û êrişên dewleta Tirk a dagirker ên ji bo tunekirina gelê Kurd li pêş çavê cîhanê bi her rê û rêbazê berdewam e. Rojane li gel bombebaran û topbaranên li ser gel û xaka Kurdistanê, leşkerkêşana artêşa Tirk a ji bo Başûrê Kurdistanê berdewam e. Di nava du heftiyan de bi sedan wesayîtên zirxî, tank û bi hezaran leşker derbasî Başûr hatiye kirin û berdewam e. Lê artêşa Tirk a dagirker û hevkarê wê PDK’ê li gel hemû hêz û piştevaniya NATO’yê nekariye li beramberî hêzên Gerîlayên Azadiya Kurdistanê serkeftinê bi destbixin.

**‘Artêşa Tirk nekariye bigihe armanca xwe’**

Rojnamevan û Nivîskar Xelef Xefûr di derbarê mijarê de got ku: “Leşkerkêşan û êrişên dewleta Tirk ji salên 90’î ve berdewam in. Berdewamiya van êrîş û dagirkeriyên dewleta Tirk li ser Başûrê Kurdistanê wê bibe sedema wêrankirina aborî û qirkirina tevahiya Kurdistanê û





Elî Hebîb

bidawîbûna çandinî û gelên li gund û çiyayên Kurdistanê. Li vir tişta baş ewe ku artêşa Tirk nekariye di plan, operasyon, dagirkerî û êrişên xwe de serkeftinê bidest bixe. Armanca wî jî tunekirina Gerîlayên Kurdistanê û kantonên Rojavayê Kurdistanê ye.”

**‘Iraq dikare bi rêya peywendiyan dagirkeriyê bi dawî bike’**

Nivîskar Xelef Xefûr di dewama axaftina xwe de qala rêya rêgirîkirina êriş û dagirkeriya dewleta Tirk kir û wiha domand: “Herêma Kurdistanê di çarçoveya dewleta Iraqê deye. Iraq jî xwedî serweriya xwe bi xweye, dikare bi rêya saziyên hikûmetê mînak wezareta karên derve, helwestek ya çareserker raber bike. Her wiha dikare bi rêya peywendiyan bang li Tirkiyeyê bike ku dawî li van operasyonan bîne. Heman demê de divê helwestek giştîgir, xwepêşandan û meşên girseyî werin lidarxistin û daxwaza bi dawî anîna vê dagirkeriyê were kirin.”

**‘Hêzên siyasî û gel divê bi hevre helwest nîşan bidin’**

Xelef Xefûr got: “Divê hêzên siyasî yên li Herêmê û Iraqê jî di asta herî jor de bicivin û li dijî vê dagirkeriyê daxuyaniyekê bidin û bang li Tirkiyeyê bikin ku nebe sedema zerer dayîna gelê Herêma Kurdistanê, valebûna gundan û çiyayên Kurdistanê. Ji ber ku beşek giring a aboriya Herêmê li ser çandinî û lawirvaniyê ye. Ev jî li çiya û zinarên Kurdistanê tê kirin.”

**‘Gelê Kurd û PKK’ê bi dawî nabe’**

Rojnamevan û Nivîskar Xelef Xefûr herî dawî wiha anî ziman: “Dewleta Tirk a dagirker li şûna ku hewla dagirkirina xaka Kurdistanê û tunekirina PKK’ê bide, divê hewla çareserkirina doza gelê Kurd bide, ji ber ku doza gelê Kurd dozek rewaye. Pirsgirêka Kurd, gelê Kurd û hêzeke siyasî ya weke PKK’ê bi dawî nabe. Ji bo wê li şûna ku dewleta Tirk hewl bide dagirkerî û zilmê bike û bibe sedema zirarên madî û mirovî, baştire ku li ser rêyek çareseriyê ji bo doza Kurd bifire.”

Di heman çarçoveyê de û ji ber êrişên dagikeriya tirk li ser Başurê Kurdistanê gelek gundên li derdora herêma Dihokê bi dare zorê hatine valekirin û gelek zevî jî ji ber êrişên dagirkeriya tirk şewitîne û malên gundiyan jî ji ber topbaranê xirabûne.

Êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê dewam dikin, di çarçoveya planên dagikirinê de artêşa Tirk gundê Guherzê ya ser bi navçeya Amêdiyê ya ser bi Dihokê ve topbaran kir.



# Li Şehbayê xiyaneta PDK’ê û nêzîkbûnên hikumeta Şamê bi dagirkeriya Tirk re hate şermezarkirin

Vîndar Roj/ Şehba

**Rêveberiya Xweser li Kantona Efrîn û Şehbayê bi daxuyaniyekê hevkariya PDK’ê bi dagirkeriya Tirk re û nêzîkbûna dagirkeriya Tirkir bi Hikumeta Şamê re bi tundî şermezar kir.**

Rêveberiya Xweser ya kantona Efrîn û Şehbayê bi tevlîbûna tavahî endamên desteyan û meclîsên Rêbeberiya Xweser li herêmê, li dijî xiyaneta PDK’ê û nîzîkbûna di navbera hikumeta Şamê û dewleta Tirk a dagirker de daxuyaniyek da.

Di destpêka daxuyanoiyê de wiha hate gotin: “Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ku bi serokatiya Malbata Barzanî ye, ji ber ku rêveberiya PDK’ê hemû derfetên xwe pêşkêşî dike, bi armanca dijminatiya Kurd, doz û Kurdayetiyê bi dewleta Tirk re li hev dike û bi hedefgirtina Tevgera Azadiya Kurdistanê re. Îmkanên herêma Kurdistanê ji dewleta Tirk re dike û rê dide artêşa Tirk ku zêdetir xaka herêmê dagir





bike, astengan çêbike, li sivîlan bigere, qedexeya derketina derve û kontrolê bi temamî li ser parêzgeha Dihokê ferz bike û ewlekarî û aboriya herêmê bike metirsî Serkirdayetiya PDK’ê ji bo berjewendiyên malbatî bi dewleta dagirker a Tirk re li ser hesabê ewlekarî û pêşeroja herêmê û pirsgirêka Kurd bi giştî xeta xiyanetê û israrkirina li ser wê nîşan dide”.

Daxuyaniyê de hate diyarkirin ku dagirkeriya Tirkiyê ji bo derbaskirina kirîzên navxweyî destdavêje dewletên cîran û wiha domand: “Divê rêveberiya PDK’ê dîroka êrîşkar û scdar a dewleta Tirk a li dijî pêkhateyên herêmê bi taybet gelê Kurd binirxîne û pêkanîna gelek komkujiyan li dijî wan û lihevkirina bi wan re tê wateya vekirina rê li pêşiya gelek komkujiya Desthilatdariya MHP û AKP’ê ji ber gelek krîzên siyasî, aborî û civakî, bi windakirina hilbijartinên herêmî yên Nîsana 2024’an, xeteriya windakirina hilbijartinên serokkomariyê û têkçûna rewşa aborî di encama polîtîkayên xwe yên dijminatiyê de hîs kir. Welatên cîran, bi taybetî Sûriyê, û gurtirbûna kirîza penaberan ku Tirkiyê bi îstîsmar û şantajê li ser hesabê wan li Ewropayê digirt, û niha xeleka nijadperestiyê li hember wan berfirehtir dibe. Ji ber vê yekê dewleta Tirk careke din bi çarenûsa xwe dilîze û hewl dide nêzîkbûna xwe bi hikûmeta Sûriyê re bike, ku di encamê de rastî gelek qeyranan bi taybet krîza aborî û penaberan tê û amadebûna xwe ji bo vegerandina peywendiyan nîşan dide bêyî ku ti garantiyek werbigire. Tirkiyê wê dagirkeriya xwe ya li herêmên berfireh ên xaka Sûriyeyê bi dawî bike”.

Di berdewamiya daxuaniyê de ev hate gotin: “Her kes dizane ku Tirkiyê bi serkêşiya hikûmeteke koalîsyonê ya nijadperest û neteweperest li dijî hemû pêkhateyên herêmê û bi taybetî jî li dijî Kurdan rola wêranker lîstiye û niha rastî qeyranan hatiye derfeta nijadperestiyê û navenda rêxistin û fînansekirina terorê ku ji aliyê DAIŞ û yên din ve tê temsîlkirin Ne veşartî ye ku armanca sereke ya dewleta Tirk ji nêzîkbûna bi hikûmeta Sûriyê re, têkbirina projeya rêveberiya xweser a herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ye ku yekîtiya xaka Sûriyê û tevna civakî parastiye, li dijî terorê têdikoşe. Tekezî li ser diyaloga navxweyî li gel hikûmeta Sûriyê û hemû aliyan bo çareserkirina kirîza Sûriyê kir”.

Di dawiya daxuaniyê de siyaseta PDK ê hate şermezarkirin, her wiha bang li hemû gelê Kurdistanê hate kirin: “Em li kantona Efrîn û Şehba siyaseta Partiya Demokrata Kurdistanê ya ku li ser hesabê doza gelê Kurd hevkarê dagirkeriya Tirkiyê dike, şermezar dikin. Em bang li Kurdan dikin ku helwesta xwe ya li ser siyaseta PDK’ê ya hevkariya bi Tirkiyeyê re diyar bikin.

# `Bakurê Sûriyeyê rûbirûyî trajediyeke nû ye`

Nivîskar û muxalifê sûriyeyî Elî El Emîn El Siwêd got: “Lihevkirinên veşartî yên di navbera hikumeta Şamê û dewleta Tirk de êdî aşkera bûn û li şûna bin masayê bin derketin jorê wê. Her lihevkirinek di navbera wan de dê nexşe û demografiya Sûriyeyê bi awayekî trajedîk biguhere û dê li gorî berjewendiyên Tirkiyeyê be, dê herêman dagir bike û axa Sûriyeyê tev li xwe bike.”

**Navenda Nûçeyan**

Nivîskar û muxalifê sûriyeyî Elî El Emîn El Siwêd der barê pêşketina têkiliyan di navbera hikumeta Şamê û dewleta Tirk a dagirker de, got: “Piştî radestkirina Tirkiyeyê bajarê Heleb ji rejîmê re, xuya ye têkiliya di navbera her duyan de pir baş bûne. Nakokiyên di navbera wan de, tenê dabeşkirina rolan di navbera aliyên Astana û Soçiyê de ne.”
El Siwêd wiha domand: “Tirkiye Heleb radestî rejîmê kir. Wê li komên çekdar fişar kir ku herêmên bêçek radestî rejîmê bikin. Wê bi lihevkirina rejîmê re, Efrîn û bakurê Sûriyeyê dagir kir. Ketina hêzên rejîmê ji başûrê Idlibê re û jinûve kontrolkirina nîvê parêzgeha Idlibê li ser vê yekê delîlek e. Li kêleka wê jî navendên Tirkiyeyê li eniyên artêşa rejîmê man û piştî bi parastina rejîmê, vekişîn navendên xwe yên niha.”

**Bi hinceta guhertina lihevkirina Edeneyê têkiliyên di bin masayê de derketin ser masayê**

El Siwêd ev li gotinên xwe zêde kir: “Dema em behsa derfeta lihevkirin an jî normalîzekirinê di navbera Enqere û Şamê de dikin, mebest ew e ku têkiliyên dualî yên veşartî aşkera bûn, ji bin masayê derketin ser masayê. Li pişt vê geşedanê, lihevkirinên nû hene. Ji van lihevkirinan xuya dibe ku wê peyman di navbera El Esed û Erdogan de çêbibe. Peyman li gorî min ew e ku bi hiceta guhertina peymana Edene, El Esed dev ji bakurê Sûriyeyê berde anku ji sînorên Tirkiyeyê bi kûrahiya 30 kîlometreyan bi dirêjahiya sînorên wê bi Sûriyeyê re.”

**Peymana ku berjewendiyên tirkiyeyê pêk tîne**

El Siwêd hişyarî da ku ev lihevkirin an jî peyman, li gorî berjewendiyên Tirkiyeyê û Mîsaqî Millî ye û wiha domand: “Heke rejîm van herêman bide Tirkiyeyê, ev wisa tê xwendin ku rejîma El Esed Tirkiyeyê xelat dike. Ji ber ku şoreşa Sûriyeyê têk bir. Rejîma Sûriyeyê jî dê îdia bike ku peymana Endene guhertiye û dê rewabûnê bide dagirkirina axa Sûriyeyê ji aliyê Tirkiyeyê ve. Anku dê xwe ji berpirsyariya 8 milyon sûriyeyiyên muxalif, bide alî.”

**Rewakirina dagirkirina axa Sûriyeyê**

Der barê armancên niha û yên nû de El Siwêd got: “Xuya ye ku lihevkirina dawîn a di navbera her du rejîman de, der barê dîtina çareseriyeke rewa ji ketina hêzên Tirkiyeyê li bakurê Sûriyeyê û rojhilatê Firatê re ye. Li beramber wê, Tirkiye ji çiyayê Zawiye vedikişe û rêya M4 radest bike. Civînên leşkerî yên di navbera komîteyên leşkerî yên artêşa Tirk û artêşa rejîmê de li baregeha Himêmîm, nêzîkbûna vê nîşan didin.”

**Bakurê sûriyeyê rûbirûyî trajediyeke din e: Tevlêkirina li dû hev**

El Siwêd diyar kir ku lihevkirinên di navbera her du aliyan de, dê nexşe û demografiya bakurê Sûriyeyê bi awayekî trajedîk biguhere. Wê zêdetirî 30 kîlometredam ji aliyê Tirkiyeyê ve bê kontorlkirin. Tirkiye dê van herêman hêdî hêdî mîna Lîwa Skenderon û Qibirsa tirkî tev li



axa xwe bike.”
Der barê pêşeroja bûyerên pêşbinkirî de, El Siwêd got: “Diyar e ku dewleta Tirk û rejîma Sûriyeyê, nêzîk bûne ku li ser rewşa Idlibê û bakur û rojhilatê Sûriyeyê li hev bikin. Lê belê ti lihevkirin, beyî erêkirina Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) çênabe. Yan jî aliyên Soçiyê dê mijûlbûna DYA bi hilbijartinên serokatiyê bi kar bîne da ku vê lihevkirinê bixe meriyetê.”

# Doh DAIŞ îro DEDAŞ

**Volqan Elî**

Li Tirkiye saziyeke kerabeyê heye; Tirk jê re dibêjin TEK (saziya kerabeyê ya Tirkiye). Çawa ku erda Kurdan di binê potînên leşkerên Tirk de her kêlî tê qirêjkirin, niha jî erdên bi xêr û bereket ên Kurdan bi têl û sîmên vê saziyê li xwediyên xwe dibin ciheneme. Dewleta dagirker ê Tirk, ji beriya dehan sal piraniya saziyên wekî TEK'ê firotin kes û şirîketên taybet.
Vaye yek ji van jî DEDAŞ e. Beşeke mezin a kar û barên (!) eleqadar bi kerabeyê, li Bakurê Kurdistê û li Tirkiyeyê ev xwînmêj dikin. Her çendî me bi nivîsandinê jê re got ‘kar’ lê di rastiya xwe de ne ti kar e. Çima? Ji ber ku xema wan ne ew e ku hema kerabeyê gel çêbikin û sererst bikin. Temam, sîmên kerabeyê kişandine, jêresaziyê wê danîne lê ne ji xêra bavê xwe re. Di encamê de têra xwe pere kom dikin û her malbat, bi şiklekî bi pergal yan mehane yan jî demeke diyar kirî pere didin wan. Ev jî ne pereyekî kêm e, milet mûçeya xwe ji nîvî zêdetir dide wan.
Ya din jî kerabe dema diçe mala Kurdan, dibe ku gelek xêra wê hebe (tên zanîn). Xema wan ne ew e ku Kurd di kela germa havînê de xwe li ber mukeyfan hênik bikin. Beredeyên xwe bi kar bînin da ku



xwarin û vexwarina wan xira nebe. Tv û înternet… tiştekî ji rêzê ye ku kerabe hebe û mirov televziyon û înternetê bi kar bîne. Lê li Bakur û Tirkiyê, bi taybetî jî li malên Kurdan, hebûna van amûran rasterast asîmîlasyon e, ji bîrkirina ziman û çanda Kurdî ye; dewleta dagirker a Tirk bi xwe ye. Ne hewce ye ku her malê mamosta û leşkerekî bişînê. Vaye yek ji karên ne xêrê yên DEDAŞ'ê jî ( navê wê çiqa jî dişibe DAIŞ'ê)
Em nabêjin kerabe, tiştekî xerab e. Na! Berewajî, niha gelên Bakur û Rojhilatê Sûrî ji ber bêkerabe bûnê bêzar bûne! Wekî tê zanîn kerabe bi quweta ava çeman çêdibe. Erdoxan û Bahçelî jî wekî hirçek (em lêborîna xwe ji hirçê dixwazin) xwe bide ber dara hirmiyê ku nehêle ti kes ji fêkiyên wê bixwe, li aliyê Bakur li ber ava Feratê bi dehan bendav çêkirine û ava Xwedê wekî çek bi kar tîne; ne berdide li ser Bakur û Rojhilatê Sûrî, ne berdide li ser Îraqê.
Lê li bendava Ataturk, Keban, Kartalkaya û bi dehan bendavên (hemû li Kurdistanê ne) din kerabe çêdike; dide bi destê DEDAŞ'ê. DEDAŞ çi dike? Me hewl da bi çend mînakan li jorê bînin ziman. Li gorî hişmendî û zêhniyeta kapîtalîzmê, ev hemû tiştên ji rêzê ne. Bi rastî jî li gorî fitrat û xuluqandina kedxwarî û dagirkeriyê, ev emel û karên asayî ne. Karebeyê çêdike, difiroşe gel ku jê feyde bike; ne ku milet pê mala xwe ronî bike, pê karê xwe biqedîne. û hwd.
Me li jor di nava kevanê de gotibû navê wê dişibe DAIŞ'ê lê diyar e ne bes ev bûye. Pratîka wê jî… DAIŞ'ê wekî rêbaz mirov dişewitandin û wisa dikuştin. Ev, rêbaza dêrên serdema navîn e û ev rêxistina post-faşîst ku ji xwe re dibeje ‘Misilman’, dabû li ser rêya dêra Xiristiyanan. Niha jî wêraseta xwe daye DEDAŞ. Par li gundên Çinara girêdayî Amadê şewat derket(2023). Gundiyan ziyaneke mezin dîtin. Sedem ev pergala kerabeyê ya DEDAŞ'ê bû. Werin wê ecêbê ku dozger û mehkemeyên dagirkeriyê jî, dest nîşanî kêmasiyên wê kirin. Îsal (20'ê Hezîranê) li heman herêmê û li hin gundên Şemrexa ser bi Mêrdînê ve ji ber hişmendî û karê ne xêrê yê DEDAŞ şewat derket; dagirkeriyê Tirk çawa ku lê temaşe kir her wisa jî pêşî li gundiyan girt da ku agir venemirînin. Dîsa jî hin gundiyan ya ji destên wan dihat kirin. Di encamê de 15 mirovan jiyana xwe ji dest dan, bi dehan kes birindar bû. Xwezaya Kurdistanê wêran bû. Walî û karmendên dagirkeriyê xwe li yek dan qaşo çûn taziyeya mirovên bibûn sedema jiyana wan. Lê gundiyên xwedan namûs, ew ji gundên xwe qewitandin û ruhê miriyên xwe şad kirin.
Pirsgirêka esas ne DEDAŞ û DAIŞ'ê: Hişmendiya dagirkeriyê Tirk e. Ew tenê amûrên qirêj ên destê dagirkeriyê ne. Sed sal beriya vê Ermen bi destê Alayên Hamidiye li Anatolya û Kurdistanê qir kirin, nehiştin. Niha jî dixwazin bi ‘tekbîrên’ DAIŞ'ê, bi kerebeya TEDAŞ'ê Kurdistanê bişewitînin, Kurdan nehêlin. Da ku Kurdistan ji wan re bimîne.
Dewleta dagirker a Tirk wekî bêje “we DAIŞ'a min teşhîr kir lê niha jî ez ê Kurdan di agirê DEDAŞ'ê bişewitînim.”



# ‘Azadiya Rêber Apo mercekî bingehîn ê çareseriyê ye’

Rêberê gelan Abdullah Ocalan bi fikrê xwe yê azad di nava tevahiya gelên herêmê de ruhê demokrasî, azadî, wekhevî û biratiya gelan neqişand. Li cografya Kurdistan û Rojhilata Navîn ku sîstema netew dewlet a serwer hewl da bi yek rengî boyax bike. Bi hişmendî û têkoşîna Rêber Apo rewş û taybetmendiya xwe ya bi hev re, pir çandî û dewlemend hate dîtin û veguherî yekîtiya gelan a li ser bingeha biratî û rûmetdariyê.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Rêberê Gelan Abdullah Ocalan 26 sal in li Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de tê ragirtin û heya niha ti agahî ji Rêber Apo nayê girtin. Dostên kurdan li 74 navendên cîhanê pêngava ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî’ dan destpêkirin. Pêngava azadiyê li seranserê cîhanê berfireh bû û bi çalakiyên cur be cur daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêber Apo tê kirin. Rêber Apo bi vê pêngavê re bû Rêber gelan a cîhanî. Çalakiyên bi daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêber Apo tên li darxsitin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê mezin dibin û bênavber dewam dikin.
Di çarçoveya pêngava cîhanî ya ji ‘Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî’ berpirsê beşê perwerdê ya Meclisa Civakî ya Ermenan Hena Somî ji Rojnemeya me re axivî.
Hena somî bal kişand ser tecrîd û zexta giran a li ser Rêberê Gelan



Abdullah Ocalan û wiha got: “Li gel van hemû rewşan em dibînin zexteke mezin li ser Rêber Apo heye. Ji ber ku azadiya Rêber Apo bû şertekî esasî ji bo azadiya gelan û ji bo çareseriyê ye. Hemwextî van zextan tecrîdeke giran jî li ser hatiye ferzkirin. Ji ber ku agahî ji Rêber Apo nayê girtin, hemû hewldan ew e ku Rêber Apo bê azadkirin. Bi vê tecrîd û zextên heyî her çiqas bixwazin berxwedan û baweriya Rêber Apo bişkînin, ew xeyalên vala ne. Ji ber ku ew Rêbereke her pêkhateyek raman û îdeolojiya wî fêm kiriye, çiqasî zextan li ser me bikin, em ê zêdetir li ser azadiya Rêber Abdullah Ocalan û mafê xwe kar bikin.”

**‘Ramanên Rêber Apo çareserî ye’**

Somî di berdewamiya axaftina xwe de da zanîn ku felsefeya Rêberê Gelan Abdullah Ocalan ji bo aloziya Rojhilata Navîn çareseriya herî pêkan e û wiha domand: “Ramanên Rêber Apo bû wesîle ku ev hemû pêkhate îro li cihekî kom bibin û nêrînên xwe bi hevre parve bikin. Ev yek ji bo avakirina sîstema demokratîk girîng e. Hêviya me ew e ku projeya avakirina civaka demokratîk li ser esasê ramanên Rêber Abdullah Ocalan li Rojhilata Navîn pêk were, da ku hemû ol, mezheb, netewe û ziman bi awayekî wekhev bijîn. Ramanên Rêber Apo çareserî û xelas bûna ji nakokiyan e. Komkujiyên ku di van salên dawî de li ser hemû pêkhateyan bi hicetên cûda hatin kirin, bi vê rêyê xwestin vê nakokîyê kûr bikin. Lê dema ku van pêkhateyan xwe bi fikira Rêber Ocalan rast kir, dîtin ku hevgirtin çareseriye, ji bo wê xwestin vê




fikirê belav bikin û da ku civak dîsa ber bi van planan va neyê kişandin û nekeve bin bandora mejiyê desthilatdaran.”

**Bêdengiya hêzên navneteweyî**


Hena Somî di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Hêzên navneteweyî û desthilatdar li hemberî tecrîda li ser Rêber Apo bêdengiya xwe dewam dikin. Rêber Abdullah Ocalan xwedî fikir û felsefeyeke ne tenê ji bo gelê Kurd, hemû gelên cîhanê pêwîstiya wan bi vî fikrî heye. Bêdengiya hêzên navneteweyî jî ji ber di bin bandora vê sîstemê de ne, dibe sedem ku bi vî rengî bêdeng bin. Ev hêz li ser wê yekê kar nakin ku ne di berjewendiyên wan de bin. Doza Rêber Abdullah Ocalan û azadiya wî kar li ser berjewendiyên wan nake, dijî berjewendiyên wan in, ji bo wê ye ev bêhelwestî û bêdengiya neexlaqî li ser Rêber Abdullah Ocalan heye. Îro azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ji bo hemû gelan û çareseriya pirsgirêka Kurd bûye şertekî esasî.”

# Wê Konseya Ewropa biryara têkildarî Rêber Abdullah Ocalan binirxîne

**Navenda Nûçeyan**

**Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê wê biryara “binpêkirinê” ya ku Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) derbarê Rêber Abdullah Ocalan de dabû, wê bixe rojeva xwe.**

Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê biryar da rewşa Rêber Abdullah Ocalan ku sala 1999'an bi komployeke navneteweyî revandin Tirkiyeyê û ji hingê ve li Îmraliyê di nava şert û mercên giran ên tecrîdê de tê ragirtin, bixe rojeva xwe.
Cezayê muebbeta giran li Rêber Abdullah Ocalan hatiye birîn û ji mafê berdana bişert jî bêpar hatiye hiştin. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ji ber binpêkirina “Mafê hêviyê”, di 18'ê Adara 2014'an de ev ceza weke binpêkirina Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) nirxandibû. DMME'yê cezayê girtîgehê yê muebbeta giran, li dijî xala 3'yemîn a PMME'yê ku êşkence û muameleya xerab qe-



dexe dike, nirxandibû. DMME'yê di pêvajoyên pêş de têkildarî girtiyên siyasî Hayatî Kaytan, Emîn Gurban û Civan Boltan jî biryarên bi vî rengî dabûn.
PMME jî biryarên DMME'yê dişopînê bê ka hatine cîbicîkirin an na. PMME'yê ji bo bingeha “mafê hêviyê” were avakirin, ji Tirkiyeyê xwest ku di qanûnan de sererastkirinan bike û sepanan biguherîne. Ji bo vê jî têkildarî Tirkiyeyê dest bi pêvajoya venêrînê kir. Li gel ku pêvajoya venêrînê hatibû destpêkirin jî Komîteya Wezîran mijar nexist rojeva civîna xwe û tu biryarên nivîskî jî amade nekir.
Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê (OHD), Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê (TOHAV), Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) ji bo biryara DMME'yê tavilê bixin rojeva xwe û ji bo cîbicîkirin/venêrîna biryaran, di 29'ê Tîrmeha 2021'ê de bi awayekî nivîskî serî li Komîteya Wezîran da. Komîteyê, piştî serlêdanê mijar xist rojeva xwe. Komîteyê, di 30'ê Mijdarê-2'yê Kanûna 2021'ê de civîna xwe lidar xist. Di civînê de komîteyê têkildarî agahdariyên rêxistinên civaka sivîl ên li Tirkiyeyê û cîbicîkirina biryaran agahî xwest.
Tirkiyeyê di 7'ê Îlona 2021'ê de bersiv da û îdia kir ku ji sala 2009'an heta niha li Îmraliyê tu binpêkirin tune ne. Tirkiyeyê hişyariyên ji bo “misogerkirina mafê hêviyê” û “guhertinên têkildarî rejîma înfazê ya cezayê muebbeta giran” jî jinedîtî ve hat û bêbersiv hişt. Tirkiyeyê tenê rapora Komîteya Pêşîlêgirtina Êşkenceyê ya Ewropayê (CPT) yên têkildarî şert û mercên fîzîkî yên Girtîgeha Îmraliyê esas girt. Rêxistinên mafên mirovan û yên hiqûqê, piştî îdiayên Tirkiyeyê di 12'ê Cotmehê de agahî dan Komîteya Wezîran. Di serlêdanê de hat gotin, Tirkiyeyê di bersiva xwe de têkildarî “Mafê hêviyê” cih nedaye tespîtên girîng ên DMME'yê, ji bo bicihanîna biryaran tu gav nîqaş nekiriye û li şûna vê agahiyên manîpulatîf parve kiriye.
Buroya Hiqûqê ya Sedsalê ji bo bicihanîna biryarên DMME'yê, di 9'ê Tebaxa 2022'yan de careke din serî li Komîteya Wezîran da. Li ser vê serlêdanê, Tirkiyeyê bersiv da û got: “Pêkane ku hikûmxwarên cezayê muebbeta giran lê hatiye birîn bişert bên tehliyekirin lê belê hinek sûcên îstîsnaî ji vî mafî muaf hatine girtin.” Tirkiyeyê di bersiva xwe de li xwe mikur hat ku Abdullah Ocalan ji “mafê hêviyê” bêpar hatiye hiştin.
Di civîna meha Hezîranê ya Komîteya Wezîran de biryar hate dayîn ku dosyaya komî ya ku Abdullah Ocalan jî di nav de ye, dîsa bixe rojeva xwe. Komîteya Wezîran wê di civîna di navbera 17-19'ê Ilonê de kontrol bike bê ka biryara binpêkirinê û pêdiviyên wê yên DMME'yê hatine bicihanîn an na. Eger komîte pêwîstî pê bibîne, wê ji Tirkiyeyê îzahet were xwestin bê ka çima biryar bi cih ne aniye.
DMME'yê her wiha ji bo Hevserokê Giştî yê HDP'ê yê berê Selahattîn Demîrtaş û karsaz Osman Kavala jî biryara berdanê dabû. Komîteya Wezîran biryar da ku Demîrtaş û Kavala dîsa bixe rojeva civînê. Komîteyê di demên berê de jî ev biryar kiribû rojeva xwe û ji ber cîbicînekirina biryara têkildarî Kavala, prosedûra binpêkirinê dabû destpêkirin.